

Xizmeta te ya piştewaniyê ji bo kesên temen mezin

Belaş û nepenî ye
Aliyê te, gotina te

(Kurdish/Kurdi (Kurmanji))



- Tu mirovekî temen mezin î û li malê pêdiviya te bi alîkariyê heye?
- Tu xizmetên lênihêrîne yên ji bo kesên temen mezin ji bo alîkariya kal û pîran bikin dizanî?
- Pêdiviya te bi alîkariyê heye ji bo ku tu xwe bigihîni xizmetên lênihêrîne yên ji bo kesên temen mezin?
- Ti pirsgirêkên te hene bi xizmetên lênihêrîna kesên temen mezin re yên tu niha bi bikartîni?

Mirovên temen mezin li Australya xwedî maf in ku xwe bigihînin xizmetên lênihêrîna kesên temen mezin û piştewaniyê. Gelek rê hene ku tu dikarî bihê piştgirîkirin. Dibe ku tu bikaribî xwe bigihîni:

- karûbarên lênihêrîna kesên temen mezin ên ku te li malê piştgirî dikan da ku alîkariya te bikin ku tu serbixwe bijî
- lênihêrîna demkurt a ku piştî birîndarbûn an jî nexweşiyê ji t re dibe alîkar ku te vegeerî li ser lingên xwe
- cihekî li maleke xwedîkirina kal û pîran dema ku tu êdî nikarî li malê bijî.

Em çawa dikarin bibin alîkar?

ADA Australya parêzvanan pêşkêş dike ji bo alîkariya we bikin:

- bizanin ka çi xizmet hene
- xwegihandina lênihêrîne û piştewaniyê
- ji xizmetên lênihêrîna xwe ya ji bo kesên temen mezin herî zêde bistînin
- lêçûnên lênihêrîna kesên temen mezin fêm bikin
- pirsgirêk an giliyên di derbarê xizmetên lênihêrîna xwe ya ji bo kesên temen mezin de çareser bikin
- mafên xwe fêm bike û pê bawer bin ku tu bi rêzdarî û dadperwerî tê dermankirin
- di lênihêrîna xwe û tiştên ku bandorê li te dike de xwedî gotin be.

Parêzvanî çi ye?

Ji bo ku tu daxwazên xwe bîni ziman û ji bo maf û pêdiviyên xwe biaxivî, parêzvanî piştgiriyê dide. Parêzvanek ADA Australya kesekî bêalî ye ku dikare guh bide rewşa te û alîkariya te bike ji bo çareserkirina pirsgirêkan.

Parêzvanek li kêleka te ye û tu çi dixwazî dê bi rê ve bibe. Ya girîng, ew dê taybetmendîya te biparêze û heta ku tu nexwazî dê bi tu kesî rre neaxive.

Xizmetên me ev in:

- Belaş, Nepenî, Serbixwe
- Ji aliyê te ve tê birêvebirin

**Bi me re biaxivin
li ser 1800 700 600**



Heger hewceya te bi wergêrekî hebe
j kerema xwe telefonî 131 450 bike

